Bundesamt
für Migration
und Flüchtlinge

Belavoka li ser kursa entegrasyonê

ji bo kesên ku nû hatine vî welatî yên xwedî mafê tevlîbûna kursê û yên tevlîbûna kursê li wan hatiye ferzkirin, herwiha biyaniyên ku demeke dirêjtir li Elmanyayê dijîn û tevlîbûna kursê li wan hatiye ferzkirin

Hemwelatiyên birêz,

li gor Qanûna Niştecihbûnê, mafê we heye ku hûn carekê tevlî kurseke entegrasyonê bibin, an jî li we hatiye ferzkirin ku hûn tevlî wê kursê bibin.

Zarok, ciwan û nûciwanên (nûgihiştiyên) ku hîn diçin dibistanekê, nikarin tevlî kursa entegrasyonê bibin.

Kursa entegrasyonê çi ye?

Kursa entegrasyonê ya giştî ji du beşan pêk tê, beşek jê kursa zimên û ya din jî kursa naskirin û jiyana li vî welatî ye.

Di kursa zimên de hûn ferî wan peyv û hevokan dibin ku di warê nivîskî û axaftina jiyana rojane de ji we re pêwist in. Bo mînak di têkiliyên ligel daîreyên fermî, danûstandina ligel cîranan û li cihê kar, nivîsandina nameyan û di dagirtina belgeyan de.

Di kursa naskirin û jiyana li vî welatî de hûn derbarê jiyana li Elmanyayê tên agahdarkirin. Di vê kursê de hûn fêrî hinek tiştên li ser sîstema dadwerî, çand û dîroka nêzîk ya vî welatî dibin.

Kursa entegrasyonê ya giştî ji kursa ziman ya ji 600 dersan (dersek ji 45 deqeyan pêk tê) û ji kursa naskirin û jiyana li vî welatî ya ji 100 dersan pêk tê. Kursa ziman ji 6 beşên her yek 100 dersî pêk tê. Ji 300 dersên destpêkê re „kursa bingehîn“ (Basiskurs), ji 300 dersên din re „kursa ziman ya pêşketî“ (Aufbausprachkurs) tê gotin.

Kursên entegrasyonê yên taybet jî hene, bo mînak yên ji bo jinan, dêbavan, ciwanan, herwiha ji bo kesên ku baş nizanin bixwînin û binivsînin. Ev kurs ji 1.000 dersan pêk tên.

Heke ku hûn gelekî zû fêr bibin, hûn dikarin tevlî kurseke taybet ya bilez û kûr bibin.

Dezgeha ku kursên entegrasyonê rêvedibe, ango pêkhînerê kursê, ku bi elmanî jê re „Kursträger“ tê gotin, beriya ku kurs destpêbike we tevlî ezmûneke diyarkirina asta we ya zimên û xwendinê dike. Di wê ezmûnê de diyar dibe, ku hûn bi kîjan kursê û di kîjan beşa kursê de destpêdikin. Ezmûna diyarkirina asta we belaş e.

KNr. 630.036o Kurdisch-Kurmanci BAMF
05/2023

Tevlîbûna ezmûna dawî

Ezmûna dawî ji ezmûna zimên û ezmûneke di dawiya „kursa naskirin û jiyana li vî welatî", ku jê re „Jiyana li Elmanyayê" (bi elmanî: Leben in Deutschland) tê gotin, pêk tê. Heke we karîbû di ezmûna zimên de îzbat bikin ku hûn heta dereceyeke diyarkirî (asta zimên B1) fêrî elmanî bûne û herwiha di ezmûna „Jiyana li Elmanyayê" de bi ser ketin, ev tê wateya ku we kursa entegrasyonê serketî derbas kir. Wê demê hûn bawernameya kursa entegrasyonê (bi elmanî: Zertifikat Integrationskurs) bi dest dixin.

Heke hûn di ezmûnekê, an jî di herduyan de bi ser neketin, wê belgeyeke derbarê encamên we de radestî we bê kirin.

Tevlîbûna ezmûna dawî belaş e

Sûdên tevlîbûna kursa entegrasyonê

Biyaniyên ku ji welatekî ne endamê Yekîtiya Ewropayê tên, heke ku bixwazin li Elmanyayê mafê rûniştinê yê bêsînor wergirin, divê hinek şertan pêk bînin. Di nav wan şertan de, divê ku heta dereceyeke diyarkirî zimanê elmanî bizanibin, herwiha xwedî zanyariyên bingehînî derbarê sîstema dadwerî û civakî û rewşa jiyana li Elmanyayê bin. Serketî derbaskirina kursa entegrasyonê tê wateya ku ev şert pêkhatî tên qebûlkirin. Wekî din jî rê xweş dibe ku hûn zûtir bibin hemwelatiyê Elmanyayê. Ji bilî wê yekê, fêrbûna zimanê elmanî ya di kursên entegrasyonê de jiyana we ya rojane li Elmanyayê, herwiha dîtina karekî asantir dike.

Qeydkirina li cem pêkhînerê kursê

Heke mafê we hebe, an jî tevlîbûna kursa entegrasyonê li we hatibe ferzkirin, daîreya biyaniyan (Ausländerbehörde) an jî daîreya ji dana pereyên bêkariyê (bi elmanî: Arbeitslosengeld) wê bi nivîskî „belgeya mafê tevlîbûnê" (bi elmanî: Berechtigungsschein) ji we re bişîne. Pêkhînerê kursê û cihên kursan yên nêzîkî we, herwiha şaxa herêmî ya Daîreya Federal ya Koçberî û Penaberan (Bundesamt) ya ji bo we têkildar hûn dikarin li ser înternetê li ser vê navnîşanê bibînin:

https://bamf-navi.bamf.de/de/

Bêzehmet xwe ji bo kursa entegrasyonê li wî cihê ji we re hatiye diyarkirin qeyd bikin û belgeya mafê tevlîbûnê radestî wir bikin. Heke cihek ji we re nehatibe diyarkirin, di zûtirîn demê de xwe li cem pêkhînerekî kursê li gor daxwaza xwe qeyd bikin. Heke li ser belgeya mafê tevlîbûnê di jêr nivîsa „Die Teilnahmeberechtigung bzw. die Teilnahmeverpflichtung ist gültig bis…" de demek hatibe nivîsandin, wê demê hûn dikarin, an jî divê hûn herî dereng heta wê dema diyarkirî xwe li cem pêkhînerekî kursê, an jî li wî cihê ji we re hatiye diyarkirin qeyd bikin.

Ji bo ku di demeke nêzîk de tevlîbûna kursê pêk bê, Daîreya Federal dikare we bişîne pêkhînerekî

kursê yê taybet.

Pêkhînerê kursê divê ji we re dema çaverêkirî ya destpêkirina kursê diyar bike. Divê kurs piştî qeydkirina we di nava şeş hefteyan de destpêbike. Heke di nava vê demê de kursekê destpênekir, divê pêkhînerê kursê we haydar bike.

Ji kerema xwe hişyarî wê yekê bin ku belgeya we ya mafê tevlîbûnê dişewite, heke hûn ji ber sedemên tekildarî we herî dereng di nava salekê de piştî qeydkirinê dest bi kursa entegrasyonê nekin, an jî bêtirî salekê navberê bidin tevlîbûna xwe ya kursê.

Tevlîbûna birêkûpêk ya kursê

Ji bo ku hûn bigihijin armanca kursa entegrasyonê, divê hûn birêkûpêk tevlî kursê bibin. Ango divê hûn berdewam heta dawiyê tevlî kursê bibin û tevlî ezmûna dawî bibin. Heke hûn bixwazin, pêkhînerê kursa we dikare belgeyeke piştrastkirina tevlîbûna we ya birêkûpêk radestî we bike.

Çavdêriya zarokan

Heke ji bo tevlîbûna kurseke entegrasyonê pêwîstiya we bi çavdêriya zarokan hebe, vê yekê ji pêkhînerê kursê re bêjin. Ewê we derbarê mecalên çavdêriyê yên heyî de haydar bike.

Guhertina pêkhînerê kursê

Guhertina pêkhînerê kursê tenê piştî qedandina her beşekî kursê mimkun e. Guhertin tenê di rewşên taybet de mimkun e, bi taybetî di dema barkirin/guhertina malê de, guhertina di navbera kursa nîvrojî û tevrojî (nîv-wext û temam-wext) de, çavdêriya zarokan, an jî ji ber destpêkirina xwendina pîşeyî, an jî destpêkirina karekî ya piştî qedandina beşeki ji kursê.

Heke hûn ji ber sedemên din pêkhînerê kursa xwe biguherînin, ew seetên ji beşên kursê ku hûn tevlî nebûne, ji kîsê we diçin.

Heke hûn ji ber sedemeke destûrdayî pêkhînerê kursa xwe biguherînin, divê pêkhînerê kursê belgeya we ya mafê tevlîbûnê li we vegerîne.

Mesrefên kursa entegrasyonê

Divê hûn weke para xwe ji bo her seeteke dersê 2,29 Euro ji kîsê xwe bidin pêkhînerê kursê. Ev para we divê beriya destpêkirina her beşekî kursê ya ji 100 seetên dersê û beriya kursa naskirin û jiyana li vî welatî (Orientierungskurs) bê dayîn. Heke hûn tevlî dersan nebin, ew pereyên ji bo wan dersên serdeçûyî li we nayê vegerandin. Heke hatina we bi xwe tine be, divê ew kesê ku ji aliyê qanûnî ve ji bo debara we berpirsyar wê para we ya mesrefên kursê bide.

Para we ya mesrefên kursê dikare ji we neyê standin, heke hûn pereyên hemwelatiyan, an jî alîkariya ji bo debarê ji dewletê (Sozialhilfe) distînin, an jî ji ber sedemeke din muhtac bin. Wekî din jî para mesrefên kursê dikare ji we neyê standin, heke hûn kar dikin û heqdestê we yê mehane (bruto) ne di jor sînoreki diyarkirî re be. Ew sînor bilindtir dibe, dema zarokên we hebin. Zanyariyên bêtir û bilindiya wan sînorên heqdest, ku salane tên guhertin, hûn dikarin di belgeyên serlêdanan de, herwiha li ser înternetê, di jêr navnîşana https://www.bamf.de/ik-kostenbefreiung de bibînin. Ji bo ku hûn para xwe ya mesrefên kursê nedin, divê hûn bi nivîskî daxwazê ji şaxa Daîreya Federal ya Koçberî û Penaberan ya ji bo we berpirsyar re bişînin.

Bêzehmet belgeyeke piştrastkirina muhtaciya xwe ligel serlêdana xwe radest bikin (nisxeya wê belgeyê, bo mînak belgeya derbarê meaşê bêkariyê, an jî pereyên hemwelatiyan, alîkariya ji dewletê ya ji bo debarê, belgeya nû ya heqdest/peymana kar, ku tê de heqdestê mehane (bruto/bi tevayî) diyar dibe, herwiha belgeyên ku miqdara serbest ya zarokan diyar dikin (Kinderfreibeträge), belgeya bacê ya dawî, an jî zanyariyên li ser şexsê xwe ji ELStAM, pereyên alîkariya kirêya malê (Wohngeld), BAFöG, alîkariyên ji bo zarokan (Kinderzuschlag), alîkariyên li gor qanûna penaberiyê, belgeya ku hûn mesrefên zarokxaneyê nadin, belgeya ku hûn beşa ragihandinê nadin, bilêta civakî ya herêmî (Sozialticket) û hwd.).

Bêzehmet heta ku mimkun be, serlêdan û daxwaza xwe beriya destpêkirina kursê bikin. Heke hûn piştî destpêkirina kursê daxwaz û serlêdana xwe pêşkêş bikin, mesrefên ji destpêka kursê heta dema serlêdanê li ser we dimînin.

Mesrefên hatûçûnê

Heke hûn pereyên hemwelatiyan (Bürgergeld) werdigrin û tevlîbûna kurseke entegrasonê ji aliyê daîreya têkildar ve li we hatibe ferzkirin, an jî ji aliyê Daîreya Federal ve biryar hatî dayîn ku hûn mesrefên kursê nedin, hûn dikarin beşek ji mesrefên hatûçûna cihê kursa entegrasyonê wergirin. Alîkarî bi rengekî yekcarî tê dayîn. Şertê ku beşek ji mesrefên hatûçûnê li we bê vegerandin ew e ku cihê kursê herî kêm 3 km ji mala we dûr be. Ji bo ku hûn beşek ji mesrefên hatûçûnê wergirin, divê hûn daxwazeke nivîskî pêşkêşî şaxa Daîreya Federal ya Koçberî û Penaberan ya ji bo we berpirsyar bikin. Şaxa ji bo we berpirsyar hûn dikarin li ser înternetê li jêr vê navnîşanê https://bamf-navi.bamf.de/de/ bibînin.

Dubarekirina herî zêde 300 seetên dersên kursê

Di hinek şertên taybet de hûn dikarin carekê heta 300 seetên dersê yên kursa zimên dubare bikin. Ji bo dubarekirinê divê hûn bi temamî tevlî kursa zimên bûbin, piştre tevlî ezmûna zimên bûbin û di wê ezmûnê de bi ser neketibin (asta zimên B1).

Ji bo ku hûn bikaribin dubare beşdarî seetên kursê bibin, divê hûn serlêdanê bikin. Bêzehmet serlêdana xwe li şaxa Daîreya Federal ya Koçberî û Penaberan ya ji bo herêma we berpirsyar bikin.

Heke hûn diçin kursa fêrkirina xwedin û nivîsandinê, ji bo dubarekirina kursa zimên ya pêşketî ne şert e ku hûn tevlî ezmûna zimên bibin, da ku hûn bikaribin 300 seetên dersê dubare bikin.

Vegerandina para mesrefên kursê

Heke belgeya we ya mafê tevlîbûnê heta 31.01.2023 hatibe derxistin, ev şertê jêrê derbasdar e:

Daîreya Federal dikare ji sedî 50ê mesrefên we yên ji bo kursê li we vegerîne, heke hûn piştî 08.12.2007ê serketî tevlî ezmûna dawî bûbin û di navbera yekemîn car derxistina belgeya we ya mafê tevlîbûnê û ezmûna dawî ne zêdetirî du salan dem derbas bûbe. Ji bo vegerandina mesrefê divê hûn serlêdanê li şaxa Daîreya Federal ya Koçberî û Penaberan ya ji bo herêma we berpirsyar bikin.

Ji bo belgeyên mafê tevlîbûnê yên ku ji 01.02.2023 û şûnde hatibin derxistin, du salan molet heye, heke hûn tevlî kursa entegrasyonê ya giştî bûbin.

Molet dibe sê sal, heke hûn tevlî kurseke taybet ya entegrasyonê bûbin (bo mînak kursa fêrbûna xwedin û nivîsandinê, kursa fêrbûna alfabeyeke duyemîn, kursa entegrasyonê ya dêbavan û jinan, kursa entegrasyonê ya ciwanan).

Têbînî, heke tevlîbûn hatibe ferzkirin

Heke daîreya biyaniyan, an jî daîreya ji bo pereyên hemwelatiyan tevlîbûna kursa entegrasyonê li we ferz kiribe, divê hûn di zûtirîn demê de xwe ji bo kursa entegrasyonê li cem pêkhînerê kursê qeyd bikin û birêkûpêk tevlî kursê bibin.

Heke hûn vê yekê nekin, ev netîceyên li jêrê rêzkirî dikarin pêk werin:

- Ev yek dikare bandorê li ser biryardana li ser dirêjkirina mafê rûniştinê bike.
- Heke hûn alîkariyên dewletê werdigirin, ev alîkarî dikarin werin kêmkirin.
- Daîreya biyaniyan dikare ji we daxwaz bike ku hûn pêşwext bi yek carî para mesrefên kursê (2,29 Euro ji bo her seeteke dersê) ji bo tevaya kursa entegrasyonê bidin.
- Cezayekî pere dikare bê birrîn.

Pêkhînerê kursa we mecbûr e daîreya biyaniyan, an jî daîreya ji bo pereyên hemwelatiyan berpirsyar agahdar bike, heke hûn birêkûpêk tevlî kursa entegrasyonê nebin.

Tiştên ku wekî din jî divê hûn zanibin

Hûn dikarin wan hemû belgeyên serlêdanê yên di vê belavokê de behskirî ji pêkhînerê kursê jî,

herwiha ji daîreya xwe ya biyaniyan, an jî li şaxa Daîreya Federal ya Koçberî û Penaberan ya ji bo herêma we berpirsyar peyda bikin. Ji bilî wê yekê, hûn dikarin wan belgeyên serlêdanê li ser malpera înternetê https://www.bamf.de/formulare jî peyda bikin.

Herwiha mecala we heye ku hûn serlêdanên xwe dijîtal jî bi rêya malpera daîreyên hikûmî (Bundesportal) ji Daîreya Federal re bişînin.

Ev daxwaznameyên li jêr rêzkirî dijîtal jî hene:

- Serlêdana destûrdana tevlîbûna kursa entegrasyonê
- Serlêdana destûrdana dubarekirina herî zêde 300 seetên dersê yên kursa zimên
- Serlêdana nedana para mesrefên kursa entegrasyonê
- Serlêdana dana mesrefên hatûçûnê, herwiha dayîna pereyekî bêtir yê rojaneyî
- Serlêdan lêvegerandina mesrefên kursê (50 %)

Bi rêya vê navnîşana înternetê hûn dikarin xwe bigihînin serlêdanên dijîtal yên li ser malpera hikûmî:

Navnîşana înternetê ya ji bo serlêdanên dijîtal

Hemû zanyariyên din yên derbarê serlêdanên dijîtal de hûn dikarin li vir bibînin:

Navnîşana înternetê ya zanyariyên derbarê serlêdanên dijîtal de

Bêzehmet hayê we ji xizmet û teklîfên cihên şêwirmendiya penaberan (Migrationsberatungsstellen), herwiha ya cihên penaberên ciwan (Jugendmigrationsdienste) jî hebe. Ew cih di dagirtina serlêdanan de alîkariya we dikin, pirsên we dibersivînin û li çareserkirina pirsgirêkên we digerin û dikarin kurseke entegrasyona ya ji bo we bikêrhatî jî peyda bikin. Cihên şêwirmendiya penaberan, herwiha cihên penaberên ciwan li nêzîkî we li kû hene, ev yek hûn dikarin ji daîreya biyaniyan, ji şaxên herêmî yên Daîreya Federal ya Koçberî û Penaberan, an jî li ser vê navnîşana înternetê hîn bibin: https://bamf-navi.bamf.de/de/.

Di belavokê de ji bo we zanyariyên giring li ser tevlîbûna kursa entegrasyonê hene. Pirsên wekî din hûn dikarin ji pêkhînerê kursê jî bikin.

Di dema ku hûn di kursa entegrasyonê de ne, sigorteya we ya qezayan tine ye.

Di tevlîbûna we ya kursa entegrasyonê de em serketinê ji we re dixwazin!